

LI SER PIRTÛKA “TEORİYÊN FOLKLORÊ”

Hayreddîn KIZIL¹

Çi zanistî çî edebî, dema bi Kurdî pirtûkeke nuh derkeve wekî xwînerê Kurd kêfxweş dibim. Lewra ziman bi nivîsên curbicur pêşde diçe.

Lê ji ber pîşeya min heke zanistî be ez gelek kêfxweş dibim. Çi kêmasî û xeletiyên wan jî hebin ne xem e. Lewra mirovê xebatkar bi xeletiyên re heval e. Mirovê bêxelet ew kes e ku naxebite, lê bêhay e ku xeletiya herî mezin teraliya wî ye.

Van salên dawî di gelek qadan de pirtûkên zanistî dertên. Mijara vê nivîsê jî pirtûkeke zanistî ya li ser folklorê ye. Ji alî Bedran Hîkmet ve hatiye amadekirin, ji 120 rûpelan pêk tê û di sala 2016an de ji nav weşanên Lîsê derketiye. Min xwest ez vê pirtûkê jî bo xwîner û lêkolîneran bidim nasîn.

Beriya danasînê divê bê gotin ku li ser berhevkerinên materyalên folklorê çî pirtûk çî kovar gelek nivîsên Kurdî hatine weşandin. Lê li ser mijar û teoriyên folklorê heya niha li Turkiyeyê du pirtûk derketine:

Yek ji van jî alî Zanîngeha Artukluyê ve hatiye amadekirin. *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Kadri Yıldırım, Ramazan Pertev, Mustafa Aslan, İstanbul 2013.

Li dû vê pirtûkê du sal şûn de ji alî weşanxaneyê Avestayê ve pirtûkek bi edîtorîya Ramazan Pertev derket, *Edebiyata Kurdî Ya Gelêrî (Dîrok-Teorî-Rêbaz-Lîteratur-Berawirdî)-I*, İstanbul 2015.

Piştî vê pirtûkê jî pirtûka Bedran Hîkmet derket. Lê ev pirtûka Bedran Hîkmet, wekî beşek ji pirtûka *Edebiyata Kurdî Ya Gelêrî* derketibû. Di çapa xwe ya nuh a wekî pirtûkekê de, derxistin an jî lêzêdekirin di çend rûpelan de heye. Em dikarin mijarê pirtûka Teoriyên Folklorê wisa rêz bikin:

1- Folklor, Di Nava Keftûleştên Civakî û Îdeolojîk De

1 Alîkar Doçent Doktor, Zanîngeha Dicleyê.

2- Folklor û Gel

3- Teoriyên Folklorê (Di bin vê sernavê de gelek teori hatine rêzkirin)

Di beşa yekem de nivîskar, agahî di derheqê cihê folklorê di jiyana mirovan de dide. Li heman beşê nêrînên lêkolîneran jî li ser mijarê nivîsîne. Li gorî vê beşê hêmanên folklorê di jiyana mirovan de xwedî cihê girîng e. Ji bo motîvasyonê, ji bo pêkanîna hîs û nirxên hevbeş, di parastin û berdeyamkirina civakê de stran, govend, çîrok, efsane...hwd xwedî roleke girîng in. Lê îro:

“....ji wê kevneşopa dêrîn bi tene hin hêmanên manewî ku ji konteksta xwe ya sirûştî qutbûyî mane; em îro pirî wan îcrayên çandî, folklorî, ji wê wateya wan a resen, sirûştî dûr, bi nêrînên xwe ve girêdayî yanê bi hizrên dînî, neteweyî an jî cureyên dî yên îdeolojîk dinirxînin. (r.8)

Ji vê şûn de nivîskar cihê folklorê di jiyana de dide ber çavan, dînamîkbûn û xwe organîzekirina folklorê digel nêrînên zanyaran vedibêje:

Li gorî Propp, Folklor a aristokrasîyê nîn e. Folklor aîdê çînên bindest, gundî, karker û navîn e... Folklor fenomeneke enternasyonal e. (r.11-14). Dîsa li gorî Propp, dema ku civakek, dewletek yanê organîzmayek dadimezirîne di helbestên epîk ên wê civakê de guherînan çêdike û ji bo îdeolojî û nêrîna xwe ya nû, destan, epîk û efsaneyan şîrove dike. Yanî li gorî wî folklor dîsîplineke îdeolojîk e jî. Li Elmanyayê lêkolînên folklorê bêtirî ji bo armanca îspatkirina (Nijada Bilind) ya Germanan hat kirin. Li Rusyayê di sed sala XXan de bi nêrînên Marksîst xebatên li ser folklorê hat kirin (r.13). Heman tişt li welatên mîna Fransa, Îngîlistan û Emerikayê jî berbelav e (r.14).

Nivîskar ji ber ku li ser bikaranîna îdeolojîk ya folklorê sekiniye divê em li vir bibêjin di amadekirina vê beşê de heke agahiyên di pirtûka *Türkiye’de Folklor ve Milliyetçilik* de lê bihata zêdekirin dê çêtir bibûya. (Arzu Öztürkmen, *Türkiye’de Folklor ve Milliyetçilik*, Weşanên İletişimê, İstanbul 2009)


Di beşa duyem de li ser hin têgihan radiweste. Naveroka xebatên folklorê, têgihên mîna *kevn*, *kevnar*, *kevneşop*, *fosilên zindî* divê beşê de tê nîqaşkirin. Li ser pênasîna wan jî radiweste. Dîsa li vir nêrînên zanyaran jî hatine nivîsîn. Di heman beşê de nîqaşên li ser “gel” jî rawestiyaye, (r.21-25) nivîskar li vir nêrîna Kurdan li ser “gel” jî dide (r.24-25).

Beşa sêyem, beşa herî fireh û beşa herî girîng a pirtûkê ye. Dibe ku ji ber vê be ev beş ji beşên dî, çêtir hatiye amadekirin. Mîna ku her du beşên pêşîn zû hatine amadekirin an jî li ser wan xwe pir neêşandiye.

Nivîskar di vê beşa dawî de teoriyên li ser folklorê dide nasîn. Ev beş bi sê binbeşan dabeş kirine. Di bin van binbeşan de jî teorî rêzkirine:

a) Teoriyên Metin Navendî (r.26-64)

b) Teoriyên Avahîsazî/Strukturel (r.64-86) -di naveroka pirtûkê de



“Avahîsaz” nivisiye-

c) Teoriyên Kontekstî (r.87-105)

Nivîskar di bin her beşan de hin serenav rêzkirine. Lê heke di naveroka pirtûkê de ji bo wan yanê ji bo her teoriyekê, rûpela wan binivîsiya dê çêtir biba.

Di bin her serenavekê de jî taybetî û agahî bo mijara wê nivîsine. Wek mînak di beşa Teoriyên Metin Navendî de gelek teorî rêzkirine. Taybetiya van teoriyan jî ev e ku ev teorî di lêkolînên xwe de metna vegotina gelêrî ji bo xwe dikin bingeh û şîrove û analîza xwe li ser wê ava dikin. Wekî; Teoriya Dîrok-Erdnîgarî (r.26-43), Teoriya Vesazkirina Dîrokê (r.43-46), Teoriya Tekamulê (r.46-47), Teoriya Mît-Rîtuêl (r.47-50), Teoriya Psikanalîtîk (r.50-60), Teoriya Bîyolojîk (r.60), Teoriya Çandî-Girsewî (r.60-62), Teoriya Dîrokî-Çandî (r.62-63), Teoriya Nîvglobalî (r.63-64).

Di bin du serenavên din de jî binbeşên din nivîsîne:

Teoriyên Avahîsazî/Strukturel, Modela Lord Raglan (r.66-69), Modela Strauss (69-72), Modela Vladimir (r.72-86)

Teoriyên Kontekstî (r.87-105), Teoriya Karîgeriyê (r.87-91), Teoriya kompozîsyona gotyarî, (r.91-98) -li cîkî teoriya **formula gotyarî** (r.87), li cîkî jî Teoriya Kompozîsyona Gotyarî hatiye nivîsîn (r.91)-, û Teoriya Performansê (r.98-105)

Em dikarin bibêjin ku ev pirtûk ji bo destpêkek bo teoriyên folklorê ye. Nivîskar di her beşekê de li ser teoriyan radiweste, car caran hin mînak ji folklorên kurdan jî dide. Ev jî taybetiyeke baş e bo pirtûkê. Lê ji ber ku çapa duyem e çî ji alî rêzkirina mijarên xwe çî ji alî çavkaniyan ve heke kêmasiyên çapa berê di vê çapê de tunebûya dê baştir bibûya.

Em ê wekî pêşniyazek di çend xalan de ji bo çapên dî nêrînên xwe rêz bikin. Beriya wê divê em cudahiyan her du çapan jî hev binivîsin. Di vê çapa nû de nivîskar, beşa “Destpêk”ê ji çapa yekem derxistiye. Çend rûpelan jî lê zêdekiriye: (r.36-37) û (r.41-42) lê çavkanî nedane, bi taybetî (r.41-42).

Heke em werin ser pêşniyazên xwe, em dikarin bi çend xalan wiha rêz bikin:

1- Mijar bi gelemperî ji berhemên li ser folklorê hatine wergerandin lê bêhna wergerê jê hinda nebûye. Dibe ku ji ber vê be problem di derbasbûna nava mijaran de heye, çend cihan de qutbûn heye. Hê mijarek xelas nebûye derbasî mijarekî dine bûye. (her wekî mînaka kawa, r.12 û bnr r.45)

An jî rasterast derbasî mijarê bûye. Her wekî mijara beşa dawî, di vê beşe de -beşa li ser teoriyên folklorê- divê sedema derketina teoriyan bihata nivîsin. Li ser pirsên çima teorî derketine, kengî, kîja teorî derketiye, çend teorî hene, avakarên van teoriyan kî ne? Bi kurtahî bihata nivîsîn dê baştir bibûya.

Kêmasiya din jî dîsa werger e. Pirtûk mîna wergerek e ku ev werger ji berhemên werger hatiye honandin yanê ne ji berhemên resen. Dema em li çavkaniyên nivîskar binêrin em ê bibînin ku gelek çavkanî bi taybetî li ser teoriyan ji Îngîlîzî bo Tirkî hatine wergerandin. Nivîskar jî ji wergerên Tirkî, wergerandine bo Kurdî. Ev jî xetereyan derdixîne. Wekî mînak dema rasterast ji berhemên resen bîn wergerandin dibe ku navê teoriyan biguhere an jî dibe ku xeteyên wergerên Tirkî derbasî Kurdî jî bibin. Ji ber vê jî çavkaniyên eslî bê wergerandîndê çêtir be. Bi vê awê ihtimala xeletiyên jî kêmîtir dibe.

2- Kêmasiyeke din jî di pirtûkê de lawazbûna çavkaniyên wê ne. Yek ji gengeşiyên di berhemên ser kurdan de ev e ku kêmasiya çavkaniyan e. Belê heke em li berhemên bi taybetî ne akademîk binêrin em ê gelek îddiyên mezin bibînin lê bê çavkanî. Pirtûka me jî xweyê mijareke girîng e lê ji alî çavkaniyên xwe ve lawaz e.

Em dikarin kêmasiyên pirtûkê ji alî çavkaniyan ve wiha rêz bikin

Kêmasiyên jêrenotan:

Dema berhemek zanistî bê nivîsîn, ji bo xwîner û lêkolîneran divê navên çavkaniyan neyê jibîr kirin. Ev hem ji bo nivîskar hem jî ji bo xwîneran gelek girîng e. Ev tişt gelek pêwîst e ji bo piştrastkirina agahiyên di nava pirtûkê de. Dibe ku xwîner bixwaze di zanistê de pêş de here, ev çavkanî ji bo rêşanîdanê, wê alîkar bin ji xwîneran re. Dîsa ev jêrenot dê alîkar bin ji bo îddia yan jî agahiyên nivîskar jî. Divê li vir em tiştêk din jî binivîsin heke berhem pirtûkek zanistî be îddiya întihalê jî ji ser xwe radike.

Dema em li pirtûkê binêrin di gelek cihan de tê dîtin ku jêrenot tune ye. Di gelek rûpelan de jêrenot nehatine nivîsîn. An jî jêrenot kêma hatiye nivîsîn. Hin mînak ji pirtûkê:

Di rûpela 9an de, di jêrenota 1em de navê berhemê heye lê kîja rûpel e nehatiye nivîsîn.

(r.32) jêrenota 3oyan pirtûk Tirkî ye nav Kurdî ye heman xeletî di rûpelên din de jî heye navên çavkaniyên Tirkî bi kurdî hatine nivîsîn

Li gelek cihan jî tu çavkanî nade:

(r.9-10) Benda ku bi “Objîk jî wekî Malînowskî dibêje ku....” dest pê dike.

(r.10) Benda bi “Walter Anderson, di şûna” dest pê dike jêrenot tune

(r.14) Benda dawî ya rûpelê jêrenot tune ye

(r.36-37) ji bo kataloga cureyên çîrokên ya Anti Aarne çavkanî nade

(r.40-42) ji bo senifandina motîfên çîrokan ya Stith Thompson nav dide. Di rupela 41ê de “Thompson bi giştî motîfan di binê van bîst û sisê sernavan de û bi van herfan qeyd kiriye” dibêje lê di jêrenotê de nade. Di “Çavkani”yê de jî navê pirtûkê tune ye.

(r.55) jêrenota 59an, çavkanî tam nîne rûpel nedaye.

(r.58) jêrenota 66an, “Dêmarîya ku di çîroka Zîzanê de derdikeve pêş me arketîpa diya xerab e.” dibêje agahî derheqê vê çîrokê de nade tenê jêrenotek heye. Nayê fêmkirin gelo çîrok bi Kurdî ye an Tirkî ye. Wekî pêşniyazek em dikarîni viya bibêjin ku ji bo arketîpa dêmarîya xedar û nebaş çîroka Pepûk, çîroka Eyşîk û Fatîk û çîroka Çêleka Zêrîn mînakên baş in di folklorê Kurdan de.

(r.95) Jêrenot nedaye, “Albert Lord, di pirtûka xwe ya...” dibêje di rûpela 93yan de navê veguhezê dibêje.

Di rûpela 98an de agahiyek gelek girîng heye lê tu çavkanî nedaye:

“Lord û Parry di îcrakirin destanekê de ji bo ispata karîgeriya formul û temayê, mînaka Dengbêj Evdo û Dengbêj Mumîn didin. Ew li îcrayekê dibin şahid ku Dengbêj Mumîn dibêje; ez ê destanekê bistrêm ku Evdo hîç nebihîstîye. Ew li wê derê li pêş Evdo û civatê destanê îcra dike û bi rastî jî Evdo beriya wî ev destan nebihîstîye. Lê piştî îcra Mumîn, Dengbêj Evdo dibêje ku ew versiyoneke di ya vê destanê dizane û wê kêliyê de destanê ji Mumin pir xweştir û dirêjtir îcra dike. Û bi vî awayî wê destanê dike aîde xwe. Di vê mînakê de, digel ku Dengbêj Evdo, ev destan berê hîç nebihîstîye jî di wê kêliyê de bi rêya tema û formulên ku di hafizaya wî de hene, ji nû ve kompoze dike. Lewra Parry û Lord dibêjin ku her îcrakirin destaneke nû ye. (r. 98)

Heman pirsgirêk di çavkaniyê-bibliyografîyê de jî heye. Dema mirov li çavkaniyê binêre rêbaza navên di wê de, mîna nivîsîna rêbaza pirtûkan fêhm dike. Lê navên li çavkaniyê hemû ne pirtûk in, gelek ji wan jî gotaran pêk tên. Ev gotarên ku di çavkaniyê de, li ser rêbaza pirtûkan hatine nivîsin cara yekem di kovara Milli Folklorê de derketine. Dû re hin gotarên di vê kovarê de hatine berhevkirin û wekî pirtûk hatine weşandin.

Hin mînak ji gotarên çavkaniya Teoriyên Folklorê:

Alan Dundes, “Halk Kimdir”, Wergêr: Metin Ekici, r.11-26

Alan Dundes, “Doku, Metin ve Konteks”, Wergêr: Metin Ekici, r.40-52

Ben Amos, “Şartlar ve Çevre İçinde Folklorun Bir Tanımına Doğru”, Wergêr: Metin Ekici, r.27-39

William R. Bascom, “Halk Bilimi (Folklor) ve Antropoloji”, r.53-62

Lord Raglan, “Geleneksel Kahraman”, Wergêr: Metin Ekici, r.75-91

Ev gotarên li jor hatine rêzkirin hemû di pirtûka *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar I*, Geleneksel yayıncılık, Ankara 2006’de derketine:

Hin gotarên di pirtûkê de hene, di cilda diduyan de, *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar II*, Geleneksel yayıncılık, hatine weşandin. Çapa vê pirtûkê ya di destê me de çapa sisêyan e Ankara 2014, çapa yekem 2005an de û çapa duyem 2010ande dîsa ji alî heman weşanxaneyê ve li Ankarayê hatiye çapkirin. Gotarên divê pirtûkê de derketine ev in:

Alan Dundes, “Folklor Nedir?”, Wergêr: Gülay Aydın, Amadekara Çapê: Sezgin Karagül, r.16-18

Roger D. Abrahams, “Halk Bilimini Etnolojik ve Sosyolojik Yönleriyle Açıklamak”, Wergêr: Ayça Yavuz, r.49-54

Carl Wilhelm von Sydow, “Coğrafya ve Masal Ekotipleri”, Wergêr: Tuğçe Işıkkhan, r.61-70

William R. Bascom, “Folklorun Dört İşlevi”, Wergêr: Ferya Çalış, Redaksiyon: Selcan Gürçayır, r.71-86

Lord Raglan, “Tarih ve Mit”, Wergêr: Levent Soysal, r.181-188

Lord Raglan, “Mit ve Ritüel”, Wergêr: Evrim Ölçer Özünel, r.189-197

Ji bil van her du gotaran du gotar jî ji pirtûka *Folklorun Sahtesi: Fakelore*, Geleneksel Yayıncılık, Ankara 2007, hatine wergirtin. Du gotarên ku ji van pirtûkan hatine wergirtin ev in:

Willam S.Fox, “Folklor Ve Fakelore”, Wergêr: Tolga Tanyel, r.35-50

Alan Dundes, “Fakelore Fabrikasyonu”, Wergêr: Selcan Gürçayır-Ash Uçar, r.71-86

Ji bil van mînakên jî xeletî hene lê ez bawer im ev mînak bes in. Lê dîsa jî divê em bibêjin ku nivîskar di beşa sêyem de bi ser ketiye lê ji alî çavkaniyan ve ev beş bihata dewlemendkirin û tekûzkirin dê gelek baş bibûya. Divê çavkaniyên xwe jî yan ji kovara Milli Folklorê yan jî ji pirtûkên wan bida ji bo xwîneran. Ji bil van bi taybetî çavkaniyên xwedî teorîyan yê resen hebûna û ne ji wergerên wan ên Tirkî ji berhemên orjînal bihata wergerandin bo Kurdî dê gelek baş bibûya.

Ji bil van di pirtûkê de li hin cihan hem ji alî bikaranîna rêzimanê ve xeletî hene hem jî bandora Tirkî li ser hevokan heye. Lê ji bo mijara me dirêj nebe. Em ê bi tenê çend mînakên bidin.

“Lewra wan folklorê ku li derveyî sînorê vê armancê dima, li derveyî xebatên xwe **hiştin** an jî tune hesiband**in** (r.13)” Divê di vê hevokê de “**hiştin**” û “**hesibandin**” yekjimar wekî “hişt” û “hesiband” bên nivîsîn ne pirjimar.

“Wan gel wekî koma gundiyan didî**tin**.” Di vê hevokê de “**didîtin**” divê yekjimar bê nivîsîn ne pirjimar.